# Guhertinên Ekolojîk û Bandora Wan li ser Jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ji Aliyê Tenduristî, Cotkarî û Aramiyê ve

Lêkolîneke Derhatî ye ji Beşa Lêkolîn û Xebatên Akademîk ên Rêkxistina GAV ya Alîkarî û Geşepêdanê






Amadekarê Lêkolînê:

**Dr. Alan Remo**



**Wergera ji Erebî: Diyala Elî**

**Redekteya rêzimanî: Bêrîvan Ebdulkerîm**


GAV FOR RELIEF & DEVELOPMENT

# Guhertinên Ekolojîk û Bandora Wan li ser Jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ji Aliyê Tenduristî, Cotkarî û Aramiyê ve

Lêkolîneke Derhatî ye ji Beşa Lêkolîn û Xebatên Akademîk ên Rêkxistina GAV ya Alîkarî û Geşepêdanê

Amadekarê Lêkolînê:

**Dr. Alan Remo**

Mafên Weşanê 2025 © Beşa Lêkolîn û Xebatên Akademîk ên Rêkxistina GAV ya Alîkarî û Geşepêdanê

Wergera ji Erebî: Diyala Elî

Redekteya rêzimanî: Bêrîvan Ebdulkerîm

**2025**

**Naverok:**


1. Kurteyeke Cîbicîkirî
2. Destpêk
3. Girîngiya Lêkolînê
4. Rêbaza Lêkolînê
5. Demjimêra Lêkolînê
6. Armanca Lêkolînê
7. Bendên Sereke yên Lêkolînê
   - ✓ Bandora guhertinên Ekolojîk li ser Tenduristiya jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê
   - ✓ Bandora kêmbûna avê li ser jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê
   - ✓ Rola jinan di cotkariyê de li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê
   - ✓ Bandora bikaranîna gubre û kêzkujên kîmyawî li ser jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê
   - ✓ Bandora guhertinên Ekolojîk li ser aramiya civakî, aborî û koçberiya jinan
   - ✓ Bandora şerê çekdar di zêdebûna bandoriyên nebaş yên ekolojîk de li ser jinan
   - ✓ Hevrûkirina bandora guhertinên Ekolojî li ser jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê bi hevalbendên wan li Iraqê re
   - ✓ Tecrûbeyên Serkeftî Yên Rêxistinan di Kêmkirina Bandoriyên Nebaş Yên Guhertinên Jîngehî de li ser Jinan
8. Pêşniyar
9. Dûmahî
10. Çavkaniyên Lêkolînê (References / Sources)

**Naveroka Nexşeyan:**

- Nexşe 1: Bandora guhertinên Ekolojîk li ser tenduristiya jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê.
- Nexşe 2: Bandora kêmbûna avê li ser jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê.
- Nexşe 3: Rola jinan di cotkariyê de li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê.
- Nexşe 4: Bandora guhertinên Ekolojîk li ser aramiya civakî, aborî û koçberiya jinan.

**Naveroka Teşeyan:**

- Teşe 1: Pîvana germahî, rehjen, fişara xwînê û derzê.
- Teşe 2: Kaniyeke petrolê li gundê Meşûq.
- Teşe 3: Dûyê agirdeyekê li gundê Bişêriyê.

## Kurteyeke Cîbicîkirî:

Pirsgirêka guhertinên ekolojîk û encamên wan yên civakî, aborî û tenduristî wekî zêdebûna pêlên zuhabûn, bilindbûna pileyên germahiyê, bager bi cureyên xwe ،tofan û agirpêketinan pirsgirêkeke mezin û metirsîdar e ku bi awayekî nebaş bandorê li endamên civakên cihêreng dike, bi taybetî jiyana jinan.

Ev lêkolîn encamên xebatekê pêşkêş dike ku di nav çarçoveya guhertinên ekolojîk de çawa tenduristiya jinan, aramiya wan a civakî û aborî li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê têk diçe. Herweha bandora kêmbûna avê û bikaranîna heyberên kîmyayî li ser wan û rola girîng a jinan di cotkariyê de li vê herêmê.

**Destpêk:**

Guhertinên avhewayê, li kêleka wê aloziyên ekolojîk bûye yek ji girîngtirîn pirsgirêk li derdora cîhanê. Ev yek êdî wekû hêmaneke berz di piraniya guftûgoyên giştî yên bi kêşeyên polîtîk, civakî û aborî ve girêdayî tê dîtin. Di destpêka derketina xwe de, ev guhertin rastî gelek gengeşeyên berfireh hatin lê piştî peydabûna hejmareke mezin ji jêder û lêkolînên zanistî yên tekûz êdî nêrîneke cîhanî hevbeş û xuya çêbû ku sîstema avhewayê tê guhertin.

Herweha alozbûna rewşa jîngehê ro bi ro metirsiyên ji rewşên şer kambaxtir bi xwe re tîne û êdî cîhan hew şiyanên piştguhkirina guhertina ekolojîk di dest de heye. Vê yekê hişt ku zanyar van guhertinên ekolojîk wekû yek ji metirsiyên cidî li ser aştî û parastina navnetewî hilbijêre.

Ev yek tê wateya bikaranîna polîtîkayên nû ji bo rûbirûhatina li van metirsiyan, dibe ku bigihêje asta guhertina şêweyê jiyan, hilbirîn û bikaranînên me. Ji ber ku avhewayeke bi lez tê guhertin hewcedarê hêzeke xurt û lêçûyî ye da ku karibin bengî wê bibin û awaza jiyanê ber bi sivikbûna bandoriyên wê ve ji nû ve saz bikin. (Kahal, 2023)

Jin û keçên ku xwe dispêrin komên hejar û paşguhkirî bêtir bandora guhertinên avhewayî li wan tê kirin hevrûkirin bi gelek komên mêran. Ev yek li çend sedeman vedigere, yek ji wan sedeman jiyabûna jin û mêran di civakên rojhilatî de. (Hesûn, 2021)

Li gorî nirxandinên Progirama Neteweyên Yekbûyî ya Jîngehî, (80%) ji bêmalan bi sedema guhertinên avhewayê jin in, ev yek dihêle ku bêtir rastî cudabûn û tundiyê li gel tundiya zayendî werin kirin, bi taybet li navendên vehewandin û konên koçberiyê ji ber ku jin li wir radizin, bi karê şûştin û xweşûştinê radibin yan jî cil û bergan di rewşên ne guncaw de li xwe dikin.

Herweha bandorên bobelatên Jîngehî û nakokiyên di encama van kambaxiyan de, dihêle ku jin û keç wekî koçber û niştehic rûbirûyî zewaca zû û bi darê zorê bibin li kêleka bazirganiya bi endamên laşê mirov. Lêkolînek bi serenavê "Tundiya ku li ser Bingehê Cure û Girêdana Wê bi Jîngehê ve Rabûyî" ku ji aliyê Yekîtiya Neteweyî ya Parastina Xwezayê (IUCN) ve hatiye weşandin, gelek rewşên ku dihêle jin di temenekî biçûk de bizewice bi sedema hejarî, kêmbûna xwarin û jidestçûna bejahiyê beramberî qezenckirina pere û sewalan tomar dike. (Camey et al, 2021)

**Girîngiya Lêkolînê:**

Di encama pirsgirêkên mezin yên ku guhertinên ekolojîk bi xwe re tine, herweha bandoriyên wan yên neyînî li ser jinan û diyarkirina metirsiyên tenduristî yên pêşbînkirî li gel têgihîştina bandoriyên civakî û aborî ev lêkolîn wekû hewildanekê ye ji bo naskirina bandora van guhertinan li ser jinên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ji hêla tenduristî, çandinî û aramiya civakî û aborî ve.

**Rêbaza Lêkolînê:**

Lêkolîner 20 formûlên lêpirsînê û 40 hevdîtinên taybet ên kesane di herêmên cuda yên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de, bi endamên civaka herêmî, desthilatdarên herêmî (weke desteyên rêveberiya xweser) herweha rêxistinên civaka sivîl re kirin. Hevdîtin bi awayekî rasterast an jî onlayn hatin kirin. Beşdarên vê lêkolînê hatin hilbijartin ji kategoriyên civakî yên cuda (weke endezyarên çandaniyê, çalakvanên ekolojîk, cotkar, mamosteyên zanîngehê, karmendên desteya çand û ekolojîk, karmendên NGO-yên ekolojî û cotkarî, bijîşk, û kesên herêmî). Rêjeya jinan 60% ji tevahiya beşdarên lêkolînê bû.

Piştî ku dane hatin berhevkirin, lêkolîner ew dane bi awayekî hîmî û celebî analîz kirin, dûv re ji aliyê wî ve hatin kontrolkirin, xwendin, vekirin, arşîv û tomarkirin. Piştî van hemû pêvajoyan, lêkolîner agahiyên herî baş ji me re bi dest xistin ku li gorî wan dest bi nivîsandina vê lêkolînê bike.

**Demjimêra Lêkolînê:**

Ji sala 2020 heta 2024

**Armanca Lêkolînê:**


Lêkolîn bandora guhertinên ekolojîk li jiyana jinan di Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de vekolîn dike.

**Bendên Sereke yên Lêkolînê**

✓ **Bandora Guhertinên Ekolojîk li ser Tenduristiya Jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê**

Encamên formûla lêpirsînê ya ku li gelek herêmên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê hatî kirin, encamên bandora guhertinên ekolojîk li ser tenduristiya jinan, nîşan da ku (85%) ji beşdarên lêkolînê bawer in ku ew guhertin bandorên nebaş û mezin li ser tenduristiya jinan dike.

Di heman demê de, (10%) gotin ku ew bandor têgihîştineke wê ya nebaş heye lê bi awayekî kêm, û (5%) bawer bûn ku guhertinên ekolojîk bi temamî bêbandor bûn li ser tenduristiya wan.




Nexşe 1: Bandora Guhertinên Ekolojîk li ser Tenduristiya Jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê

Guhertinên ekolojîk û encamên wan bi awayekî nebaş li ser tenduristiya jinan di Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de bandor dikin, li gorî eşkereyên belgekirî yên bijîşkan ku di formûl û hevdîtinan de beşdar bûbûn. Ev bandorî bi kurtî dikarin di xêzikên li jêr de were nîşandan:

1. Jin bi gelemperî bi nexweşiyên laşî dikevin, weke nexweşiyên bêhnstandin û vedanê, nexweşiyên çerm, derengmayîna anîna zarokan, kirîtbûna makê, beravêtina zarokê, hepatît û zikçûn.

2. Lawaziya di tîmarbûnê de ya ku di encama kêmbûna xwarinê de tê derketin, bi taybetî di dema ducanîbûn û şîrdayînê de, çaxê ku hewcedariyên xwarinê yên jinan zêde ne. Ev rewş bandorê li ser tenduristiya wan û ya zarokên wan dike.

3. Bilindbûna germahiya hewayê dibe sedema astengiya zêdebûna mirin ،lêxistinên rokê û westandina ji germahiyê.

4. Jin gelek nexweşiyên derûniyê digirin, weke depresyon, nîgeranî, saw, nexweşiya piştî bizdanê, nexweşiya çûna dilçûnê û jana kesayeta sînorî. Ev hemû nexweşî dikarin di dawiyê de jinê ber bi xwekuştinê ve bibin.

5. Zêdebûna tundûtijiya laşî û zexta zayendî li dijî jinan di şert û mercên şers de.

6. Li gorî lêkolîneke ku Komîsyona Bilind a Mafên Mirovan ya Neteweyên Yekbûyî bi navê "Amadekariyên Avhewayê yên ku Zayendê Berçav Digirin", ava vexwarinê ku tev xwê ye bi sedema bilindbûna rêjeya xwê di deryayê de dihêle ku zarok di demeke zû de were herweha mirina dê û zarokên nûhatî.

Derbarê vê yekê de, Dr. Iman Îsa ku bijîşkeke jinan e, dibêje: Gelek nexweşiyên jiyanê hene ku jin bi wan re bi sedema guhertinên ekolojîk dijîn, weke bilindbûna fişara xwînê, şekerê ducaniyê û reşepêşbûna zarokan. Herweha berdewam dike û dibêje ku ne hejmarên belgekirî hene û ne jî lêkolînên zanistî li ser vê mijarê li herêma me hene.

Di heman demê de Helîme Xelîl ku rêveber e li Akademiya Perwerde û Zimanên Cîhanî li Qamişlo got ku akademiya wan kursên fêrkirinê di qada parastina nexweşî û alîkariyên destpêkê de pêşkêş dike. Ev kurs ji bo jinan alîkar in ku piraniya pirsgirêkên wan yên aborî û tênduristiyê çareser bike herweha asta wan di qada tenduristiyê de zêde dike û dihêle ku girîngiya parastina tenduristiyê fam bikin û nexweşiyên jinan ên herî berbelav nas bikin. Ev hemû tişt dikarin bi awayekî baş bandorê li tenduristiya jinan bike.


Zêde kir û got: hin jin hene ku li nav navendên tenduristiyê digerin û li wir dest bi xizmeta pêwîst dikin, weke pîvandina germahiyê, fişara xwînê, rehjen û daleqandina seruman ji bo malbat û cîranên xwe.




Teşe 1: Pîvandina germahiyê, rehjen, fişara xwînê û lêdana derziyan.

- ✓ **Bandora kêmbûna avê li ser jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê**

Encamên lêpirsînê nîşan da ku 90% ji beşdaran gotine bandora kêmbûna avê li ser jinan neyînî ye. Di heman demê de 5% bawer bûn ku ev bandor erênî ye û 5% jî gotine ku kêmbûna avê tu bandorê li ser jinan nake.




Nexşe 2: Bandora kêmbûna avê li ser jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê

Kêmbûna avê bi şêwazekî nebaş bandorê li ser jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê dike, û tê nasîn weke yek ji pirsgirêkên herî mezin ku jin rastî wan tê, bi taybet di bajarê Hesekê de.

Li gorî rapora Komîteya Navneteweyî ya Heyva Sor, bi milyonan kes li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê rastî pirsgirêka kêmbûna avê bi awayekî domdar tên.

Bandora kêmbûna avê li ser jinan bi kurtahî bi van xalan tê nîşandan:


1. **Zêdebûna Tundiyê**: Guhertinên ekolojîk dibin sedema kêmbûna çavkaniyên avê, ev yek dihêle ku rewşên tundutijiya laşî û derûnî di nav malbatê de zêde bibin, bi taybetî li dijî jinan. Ji ber ku di piraniya malan de berpirsiyariya dagirtina tenekeyên avê li ser jinan tê danîn.
2. **Zêdebûna Mêtingeriya Zayendî**: Kêmbûna avê zextan li ser jinan zêde dike û wan dike dîlê sûdwergeriya zayendî beramberî peydakirina avê. (Li gorî gelek beyanname û belgeyên ku ji aliyê çalakvanên civakî ve hatine tomarkirin, hin jinên ku di nav kampên penaberan de dijîn dema ku parvekirina avê tê kirin, rastî rewşên destdirêjî, tevgerên zayendî û pîskirinê ji hêla hin zilamên nav xelkê û yên ji karûbarên rêxistinên navneteweyî û herêmî ve tên.)
3. **Zêdebûna bar û berpirsiyariya jinan**: Di piraniya rewşan de, berpirsiyariya berhevkirin û dagirtina tenekeyên avê li ser jinan tê danîn. Ji bo vê armancê, gelek caran pêwîst e ku jin rêyên dûr hilbijêre da ku bigihêje çavkaniyên avê, ev bi xwe xebateke giran û westiyayî ye. Ev karên wisa barekî duqat li ser jinan zêde dike û carinan rê li ber karên din digire.

4. **Bikaranîna ava qirêj**: Ji ber ku di bajarê Hesekê û gundên li derdora wê de ava paqij nayê peydakirin, piraniya gelê herêmê pêdiviyên xwe bi ava embaran pêk tînin ku gelek caran ne paqij e. Ev rewş metirsiya nexweşiyên weke zikçûn, nexweşiyên çerm û givêrînê li cem niştecihan zêde dike. Herweha kêmbûna avê dikare bibe sedema kêmbûna paqijiya kesayetî bi taybetî li gel jinan di dema heyvik û havînê de. Ev kêşe wan rûbirûyî pirsgirêkên tenduristî û derûnî dike ku bi sedema wan bi şermî û reswayê hest dibin.

5. **Kêmbûna jêderên darayî**: Gelek jin li ser cotkarî û xwedîkirina ajalan jiyana xwe bi rê ve dibin. Kêmbûna avê dibe sedema qelsbûna berhemên cotkariyê û gihaştina zererên berbiçav li ser ajalan, ev yek dihêle ku rewşa jinan ya darayî aloz û têkçûyî bibe herweha nakokiyên malbatî û civakî zêde dike. Li gorî endezyarê çandiniyê Ehmed Osman, ev ji sedemên sereke ne ku jin rastî wan tên.

### ✓ Rola jinan di cotkariyê de li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê

Encamên lêpirsînê nîşan didin ku (70%) ji beşdarbûyan bawer in ku rola jinan di cotkariyê de mezin bûye, lê (20%) wan anîn ziman ku ev rol qels bûye û (10%) jî bawer in ku rola jinan di qada cotkariyê de tune ye. (kêşe 3)




Nexşe 3: Rola jinan di cotkariyê de li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê

Jinên gundî di cotkariyê de rolên girîng û serekeyî lîstine û bi awayekî mezin û berz bûne parêzvanên ewlehiya xwarinê.

Rola wan di cotkariyê de, di xuleyên jêrîn de tê diyarkirin:

1. Birêvebirina projeyên taybet bi xwe derbarê cotyariyê de, wekî çandina sebzeyan di xaniyên parastî û qutiyên plastîkî de bi rêya şopandina karûbarên kargeh û karkeran herweha çavdêriya rewşa heyberên hatine çandin ji destpêka çandiniyê ve heta bidestxistina hilber û bazirganiyê.
2. Xebitandin bi malbatê re û alîkarîkirin di çandina zeviyan de, wekî genim, ceh, nîsk, kemûn û kizbera, di deştên vekirî de. Herweha depokirina wan.
3. Xebitîna di malên xwe de li ser xwedîkirina lawiran, wekî çêlek, pez, bizin, balinde û mêşên hingiv.
4. Xebitandin wekî skarkerên rojane di qada cotyariyê de, wekî çandina tov, çinîna zeviyan û aşêfkirinê herweha karên cotyariyê yên din.
5. Alîkarî di zêdekirina darayî ya malbatê de, bi firotina hilberên cotyariyê wekî nok, nîsk, firîk, çêkirina şîr û penîr û ava fêkî. Firotina wan an li gundê xwe an jî di bazarên herêmî de.
6. Alîkarî di biryarên têkildar bi rêveberina çavkaniyên cotyariyê de, ku rola wan di pêşvebirina geşepêdana herêmî de xuyan e.

Di vê çarçoveyê de, Leyla Omar, ku ji gundên Tirbespiyê ye, dibêje ku rola jinên gundî di cotyariyê de girîng e û gelek jin bi hêz bûn di vê qadê de. Lê bi gotina wê, di pênc salên dawiyê de ev rol bi

awayekî xuyayî bi paş ket. ji ber belavbûna agirdûyên petrolê yên destpêkî û têkçûna ekolojîkê di gundên wan de. Vê yekê hişt ku hilbirîna zeviyên çandiniyê lawaz û xirab bibe pê re mirina pez û lawiran. Vê rewşê hişt ku jin berê xwe bidin karine din di qadên kar yên cuda de. (Kêşe 2 û 3)





Teşe 2: Kaniyeke petrolê li gundê Meşûq

Teşe 3: Qirêja agirdûyan li gundê El-Beşîriyê

✓ **Bandora bikaranîna gubre û kêzkujên kîmyawî li ser jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê**

Bikaranîna gubre û kêzkujên kîmyawî bi awayekî nebaş li ser jinan di Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de bandorê dike. Em dikarin van bandoriyên nebaş di xulanên jêrîn de bibînin:

1. Beşek ji van gubre û kêzkujên kîmyawî yên li bazarên herêmî tên firotin, hilberên wan ne beş û bandorkar in. Hin caran ji bo cotkaran wekî bergirtên qediyayî tên firotin. Zêdeyî vê yekê pijiqandina wan bi awayekî domdar û ne birêkûpêk, dibe sedema çêbûna bergiriya êşan û gengaziya pêketin û berbelavbûna wan. Ev yek di dawiyê de arîşeyên kêmbûna berhemên avî hem bi awayekî çendanî hem jî celebî çêdike û derbasbûnên darayî yên jinên xebatkar kêm dike. (Remo, 2019)

   Li gorî lêkolînê, di pênc salên dawiyê de hate temaşekirin ku hin nexweşiyên kuvarkî zêde bûn, wekî nexweşiya belxesipîk û peredûke li ser çend cureyên kundiran. Herweha nexweşiya lekdariya pelan li ser ceh û bo yekem car nexweşiya Puccinia graminis li ser genim li Hesekê hat dîtin, ku ew yek ji girîngtirîn nexweşiyên kuvarkî ye ku hilbirînê kêm dike. Ev jî dibe sedema nizimbûna derbasbûyên darayî yên jinên cotkar. (Remo, 2019)

2. Nepabendbûna jinan bi awayên parastinê wekî danîna maskan, lepik, kiras û solên dirêj di dema pijiqandina gubreyên kîmyawî de, dibe sedema bêhnkirina wan heyberên Kîmyawî ku pişt re vereşandin, jihişçûn û jehrandinê li cem wan çêdike.


3. Tûşîbûna zêde li heyberên kîmyawî bandorên nebaş li ser tenduristiya zayendê li cem jinan dike.

4. Tirsa ji metirsiyên tenduristiyê ji ber bikaranîna heyberên kîmyawî, dibe sedema paşveçûna karê hilberînê li gel jinan herweha dihêle ku jin erkê berpirsiyarê biavêje li ser xeynî xwe da ku karibin dahatên xwe ewle bikin.

Bandora gubre û kêzkujên kîmyawî ne tenê li ser jinan e, lê belê bikaranîna wan bi awayekî bêparêz dikare qirêjê li ax, av û hewayê zêde bike. Herweha rêjeya heyberên jehrî di nav şînkahî, goştê lawiran û sebzeyan de bilind dike ku gelê herêmê wan xwarinan wekî jêdereke bingehîn hildibijêrin. Li gorî endezyarê çandiniyê, Abdullah Huseyn.

### ✓ Bandora guhertinên Ekolojîk li ser xwecihbûna civakî û aborî ya jinan

Encamên lêkolînê nîşan da ku (%80) ji beşdarên berpirsiyar bawer in ku ew guhertinên ekolojîk bi awayekî nebaş bandor kirine û (%5) gotine ku bandora wan bi ewle û erênî ye herweha (%15) bawer in ku ew guhertin nikarin tu bandorê bikin. (Nexşe 4)




Nexşe 4: Têkiliya guhertinên ekolojîk li ser xwecihbûna civakî û aborî ya jinan

Guhertinên ekolojîk bi awayekî nebaş li ser xwecihbûna civakî û aborî ya jinan bandor kiriye. Em dikarin van bandoriyan bi vî awayî bibînin:

1. **Koçberî û penaberbûn**: Guhertinên ekolojîk û encamên wan yên xirab bûye sedema koçberiya hêdî-hêdî, ji bajarekî ber bi yê din an jî ji gundekî ber bi bajêr ve. Di bajarê Hesekê de, sedemên koçkirinê ber bi Amûdê ve kêmbûna avê, çolbûn, kêmbûna rûberên xwezayî, ziwabûn, bablîsokên axî, kombûna qirêj û gemarê li nav koçk û taxan herweha kolana çalan bi awayekî ne birêkûpêk bûn. Li gundên Tirbespiyê jî mînakên koçberiyên hêdî-hêdî ber bi bajarê Qamişlo ve hatin dîtin. sedema wê jî qirêjbûna hewayê û axê bû ku ji ber bikaranîna agirdûyên pitrolê rûda. Herweha şer û rewşa dijwar a jiyanê bû sedema koçberbûn û veguhestina ber bi Başûrê Kurdistanê, Ewropa û welatên derve ve.

2. **Guhertina rol û berpirsiyariyên jinan**: Ji ber guhertinên ekolojîk, jin hewcedar dimînin ku rolên zêde bidin ber xwe, wekî amadekirina avê, karkirina bi demeke dirêj di şertên dijwar de. Vê yekê jî bandor li ser beşdariya wan di jiyana civakî de kir.

3. **Zêdebûna zextên civakî:** Guhertinên ekolojîk û encamên wan sedema rewşa ne ewle ne, dihêle ku presên civakî jî li ser jinan zêde bibin.

4. **Bandorkirin li têkiliyên civakî:** Koçberiya domdar û şerên girêdayî bi pêşkêşkirina alîkariyê ji bo koçberan bûne sedema hilweşîna girêdanên civakî. Ev rewş bi taybetî jinan dide ber

dijwariya veqetîna ji civakê di dema ku piştgiriya civakî ji bo wan pêwîst e, hêdî _hêdî bi paş ve vedigere.

5. **Wendabûna çavkaniyên derbasbûnê:** Guhertinên ekolojîk sedema lawazbûna çandiniyê ne bi herdu beşên xwe yên şînkahî û ajalî ve. Vê rewşê jin dan li ber berpirsyarî û şerê giran ji bo parastina ewlebûna xwe ya aborî.

6. **Zêdebûna hejariyê:** Wendabûna çavkaniyên derbasbûn û xwezayî sedema zêdebûna hejariyê ne ku ev yek bi rêyeke rasterast bandorê li ser jiyana jinan û hêza wan a li ber bicihkirina hewcedariyên bingehîn yên jiyanê dike.

Li gorî gotinên Rîma Murad ji bajerê Qamişlo ku gelek hevalên wê çavkaniyên derbasbûyî yên wan ji cotkarî û parastina ajalan tê windakirin. Ji ber vê sedemê hatine neçarkirin ku ji gundên xwe koçber bibin ber bi bajêr ve di 5 salên dawiyê de, ji ber qutbûna hêza elektrîkê, kêmbûna av û heyberên şewitandinê yên bingehîn. Herweha qirêjbûna axê jî bû sedema hilweşîna qada çandiniyê.

- ✓ **Bandora şerê çekdar di zêdebûna bandoriyên nebaş yên Ekolojîk de li ser jinan**

Şerê çekdar bi guhertinên ekolojîk ve girêdayî ye ku bandorên giran li jiyana jinan bi rê û rêbazên curbecur dıke û girêdayî wê ev xal jî zêde dibin:

- **Wêranbûna binesaziya bingehîn û lawazbûna xizmetguzariyê:**

Nakokî û şerên çekdar dibin sedema wêranbûna jêderên jiyanê yên bingehîn, wekî stasyonên avê, pergala tevgeha avdanê, û xizmetên tenduristî. Ev yek jî dihêle ku jin bi zehmetî karibin bigihêjin ava paqij û bêtir tûşî nexweşiyên di encama qirêjê de derdikevin bibin.

Di nav vê rewşê de, jin ku gelek caran berpirsiyariya parastina malbatê li ser wan e astengiyên giran li hemberî nexweşiyan dikişînin.

- **Zêdebûna barên aborî û civakî:**

Bi koçberî û wendabûna çavkaniyên darayî ji ber şerê çekdar, gelek jin hewcedar dibin ku karên zêdetir bikin, wekî berhevkirina av, xwarin û afirandina rêyên jiyanê di nav şertên jîngehî yên ne xweş de. Ev barê duqat ne tenê li ser aboriya malbatê bandor dike, herweha zexta hestyarî û derûnî jî zêde dike ku bandorên nebaş li saxlemiya fizîkî û hişmendî zêde dike.

- **Zêdebûna tundutijî û nijadperestiya civakî:**

Jin di rewşên şer de bi taybet bandor li wan tê kirin, ji aliyê tundutijiya malbatî û Mêtingeriya cinsî ve. Têkçûna rewşa aborî û civakî di bin şert û mercên şer de dibin sedema zêdebûna van pirsgirêkan. Herweha jihevketina têkiliyên civakî û pergalên yasayî dibe sedema kêmbûna parastina mafên jinan û lawaztir bibin li ber felaketên ekolojîk.

- **Têkiliyên şerê çekdar bi polîtîkayên xweşîkirina jîngehî re:**

Şer dibe sedema lawazbûna hêz û karîgeriya rêveberiyên giştî di pêkanîna polîtîkayên xweşkirina jîngehî û guhertinên wê de. Ev rewşa dijwar dihêle ku hewldanên kêmkirina bandoriyên jîngehî binketî bimînin. Li hember vê yekê, jinan – ku gelek caran bi rolên girîng lîstine di rêvebirina çavkaniyên xwezayî û parastina mal û civakê de – lawaztir dikin li ber bandorên felaketên jîngehî.

- ✓ **Hevrûkirina bandora guhertinên Ekolojî li ser jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê bi hevalbendên wan li Iraqê re**

Ji bo hevrûkirinê, hêjayî gotinê ye ku çawa guhertinên ekolojî li Iraqê bandorê li ser tenduristiya jinan û xurtbûna wan ya aborî û civakî dikin, bi taybetî ku rewş û kevneşopên her du welatan nêzî hev in. Guhertinên ekolojî li Iraqê wekî bilindbûna germahiyê û kêmbûna avê, dibe encama duqatiya rewşa giran a Jîngehê, bi awayekî rasterast û ne-rasterat dikarin bandoriyên giran li ser tenduristî û astengiyên aborî û civakî yên jinan bikin.

Di yekê Tişrîna 2021an de, Ofîsa Yekîtiya Neteweyên Yekbûyî ya Rêxistina Karên Mirovahiyê (OCHA) raporek belav kir ku tê de dibêje: "Kêmbûna asta avê di Dîcleyê de û rewşa ziwabûnê bandorên xwerû li ser ewlehiya xwarinê ya malbatên ku bi cotkariyê jiyana xwe didomînin li herêma Reqa û Dêra zorê kir. Kêmbûna çavkanî û bilindbûna nirxên pêdiviyên cotkarî, tevî sotemeniyê, dihêle ku zeviyên çandiniyê kêm bibin û avjeniya sergihakirî ji bo çandiniyê bêtir were hanberkirin".

(Daraj, 2023, Ziwabûn, Tepînk, û qedexekirina mafên jinan.. hêvî ji dadperweriya ekolojîk li Rojhilata Sûriyê)

Lê li Iraqê, guhertina ekolojîk yek ji astengiyên herî mezin e ku di salên dawiyê de rûbirûyî wê hatiye. Li gorî rapora Banka Cîhanê ya sala 2020an, heta sala 2050ê, pileya germahiyê 2 dereceyan ji sedî li Iraqê dê bilind bibe û baran 9% kêm bibe, ku ev jî dibe sedema zêdebûna ziwabûnê. Ev rewş bi rêya rast bandorên giran li ser rêjeya jiyanê ya gelek jinan, bi taybetî jî li deverên gundî dike.

Di derbarê vê yekê de, gelek malbat li ser cotyarî û xwedîkirina lawiran jiyana xwe bi rê ve dibin. Bi dijwariya zextên ziwabûn û kêmbûna çavkaniyên avê, gelek ji wan neçar dibin ku vegerin bajarên mezin da ku çavkaniyên nû yên kar bibînin. Li gorî lêkolînan ku koçberiya navxweyî bi sedema ziwabûnê gihiştiye heta 25% di hin parêzgehan de, wekî al-Muthanna û Nasiriyah.

(Îrade El-Jebûrî, "Bandora Guhertina Ekolojîk li ser Jinên Iraqî: Kirîzeke berdewam")

Li gorî Yekîtiya Neteweyên Yekbûyî, welatên ku asta wan ya siyasî û aborî lawaz e, wekî Iraq û Sûrî, herî zêde bi bandora guhertinên ekolojî rayda dibin. Yekîtiya Neteweyên Yekbûyî metirsiyên van guhertinan di raporeke xwe ya dawî de bi pênc senaryoyan nîşan da:

- Guhertina ekolojîk rê li ber zêdebûna rikberîkirina li ser ax û avê dike.
- Guhertina ekolojîk bandorê li ser hilberandina xwarinê û zêdebûna birçîbûnê dike.
- Guhertina ekolojîk dihêle ku mirov koçber bibin û cihê xwe biguherînin.
- Guhertina ekolojîk hejarî û nedadiyê zêde dike.
- Guhertina ekolojîk metirsiyên ewlehî yên jinan û keçan zêde dike.

- **Tecrûbeyên Serkeftî Yên Rêxistinan di Kêmkirina Bandoriyên Nebaş Yên Guhertinên Jîngehî de li ser Jinan**

Di herêma Rojhilata Navîn de gelek tecrûbeyên serkeftî yên rêxistinên ku xebatên xwe li ser kêmkirina bandorên nebaş yên Jîngehê li ser jinan û bihêzkirina wan li hemberî van guhertinan di şert û mercên guncaw de, derketin holê.

- **Tecrûbeyên li Iraqê:**

Rêxistina "Tebîeta Iraqê" (Nature Iraq): Ev rêxistin di pirojeyên jinûavakirin û sazkirina Jîngehê de beşdar bû. Li hember vê yekê, jin beşdarî bernameyên bihişkirin û fêrkirinê li ser teknîkên cotyarî yên bêzerer û rêveberiya çavkaniyên avê kirin. Vê xebatê karîbû rêyên jiyanê ji bo jinan baştir bike herweha alîkariyê di avakirina biryarên jîngehî yên xwecihî de bike.

- **Tecrûbeyên li Misrê:**

Çend rêxistinên herêmî projeyên vegerandina daristan û başkirina rêveberiya avê li deverên gundî bi cih anîn. Ew proje armanca wan alîkarîkirina jinên ku di qada cotyarî de kar dikin de bû, bi rêya kursên fêrkirin û zêdekirina hişyariya wan li ser pratîkên cotyariya domdar herweha perwerdekirina wan li ser birêvebirina xerckirina jêderan.
Vê xebatê karîbû ku kêmasiyên aborî û civakî yên guherînên jîngehê li ser jinan têk bibe.

- **Destpêşxeriyên Herêmî û Hevkariyên Navneteweyî:**

Rêxistinên wekî WWF Middle East û IUCN, bi hevkariya hin rêxistinên herêmî, li ser çêkirina bernameyên ku jin tê de bi şert û mercên ekolojîk re guncaw bibe xebitîn.
Bi rêya van hevkariyan, kampanyayên civakî tên avakirin ku li ser bikaranîna teknîkên hêza vejînkirî û rêveberiya çavkaniyên xwezayî yên domdar kar dikin. Ev xebat rê dide jinan ku rûbirûyî guhertinên ekolojîk bi nermayî werin.

Ev tecrûbe nîşan didin ku beşdariya jinan di çêkirina biryarên jîngehî û bernameyên ku li ser pêdiviyên wan yên herêmî hatine avakirin, hêmaneke bingehîn û sereke ye ji bo kêmkirina bandoriyên guhertinên jîngehî û pêşxistina aştiya aborî û civakî di nav rewşên jîngehî yên guhêrbar de.

✓ **Pêşniyar**

- Bilindkirina hişyariya jîngehî û perwerdehiya tenduristî.
- Lêkolîn û xebatên zanistî li ser bandorên nebaş yên guhertinên jîngehî li ser jinan.
- Destnîşankirina xizmetên tenduristiyê û piştgiriya tenduristiya zayînê.
- Têkoşîn li dijî tundiya li ser bingehê zayendê.
- Pêşkêşkirina ava paqij ji bo jinan.
- Pêşveçûna beşdariya jinan di komîsyonên rêveberiya çavkaniyên avê de.
- Fêrkirina jinan li ser teknîkên cotyariyê yên ku avê qezenc dikin.
- Pêşvebirina huner û bazirganiya cotyariya jinan.
- Çandina dar û çêkirina daristanên sînteţîk.
- Pêşkêşkirina amûr û heyberên cotyarî ji bo jinan ji hêla desthilatdariya herêmî û rêxistinên civakî ve.
- Piştgiriya avakirina hevkariyên cotyarî yên jinan.
- Bidestxistina çalên petrolê yên fermî ji berdêla agirdûyên sertayî.
- Bikaranîna tabloyên jêderî di pêxistina çalên çandinî de ji berdêla agirdûyan.
- Dûrketin ji bikaranîna zêde ya gubreyên kîmyewî û kêzkujan.
- Bikaranîna gubreyên lebatî (organîk)
- Bikaranîna rêbazên parastina jîndarî.
- Pêşkêşkirina piştgiriya darayî û geşpêdankirina jinan.
- Bilindkirina hişyariya civakî û piştgiriya civakî ji bo jinan.
- Başkirina xizmetên civakî û pêşkêşkirina piştgiriya derûnî ji bo jinan.

- **Dûmahî**

Guhertinên jîngehê li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ji pirsgirêkên dûvûdirêj yên hebûnî ne, bi taybetî di dema berdewamiya şerê çekdar û bandoriya wê li ser binesazî û çavkaniyên xwezayî de. Bi zêdebûna metirsiyên jîngehî wekî ziwabûn, qirêjbûn û kêmbûna avê, jin dibin xeleka herî lawaz, çimkî giraniya herî mezin a van guhertinan li ser asta tenduristî, civakî û aboriyê radigirin.

Herwisa, van kirîzan jî derfet da ku rê were vekirin bo dîtina çareseriyên domdar ku jin bi awayekî çalak tê de beşdar bibin û ne tenê di rolên qurbaniyê de bimanin. Li vir, rola rêxistinên ne-fermî, desthilatdariya herêmî û civaka navneteweyî xuya dibe di piştgiriya projeyên jîngehê yên domdar de ku jin birêvebirina çavkaniyên jîngehî bike û çareseriyên guncaw pêşkêş bike ku bandora jêmayên jîngehî siviktir dikin.

Herçiqas ev lêkolîn ronahiyê diavêje li ser bandorên nebaş yên guhertinên jîngehî li ser jinan, di heman demê de dixwaze siyaset û bikaranînên ku hêza jinan zêde dikin were hilbijartin da ku jin karibin bi rûmeta xwe hevkariya bingehîn a avakirina pêşerojeke domdar û bi dadmendiya jîngehî were çesibandin.

### ✓ Çavkaniyên Lêkolînê (References / Sources)


- Alan Remo, 2019, Lêkolîna Xelekî ya Nexweşiyên Genim li Parêzgeha Hesekê, Kovara Sûriyeya Lêkolînên Cotyarî, Hejmara 2, Cilt 3, kewçêr 2019.
- Elma Hesen, 2021, Jin û Keçik Çawa Di Dewletên Erebî de Ji Guhertina Avhewayê Bandor Dibin?, BBC Arabî.
- Bernameya Neteweyên Yekbûyî ya Jîngehê, 2022, Guhertina Ekolojîk Tundiya Dijî Jin û Keçikan Zêde Dike.
- Kehal, 2023, Guhertinên Ekolojîk û Xerabûna Jîngehê — Ber bi Guhertina Siyasetên Dadmendî a Pergala Guherandina Hewayê, Kovara Lêkolînên Yasa û Polîtîkî, Cilt 8, Hejmara 1, rûpel 17.
- Rûqeya El-Ebadî, Daraj, 2023, Ziwabûn, Tepînk û Astengkirina Mafên Jinan... Hêvî bi Dadmendiyeke Ekolojîk li Rojava.
- Irade El-Jibûrî, 2024, Bandora Guhertina Ekolojîk li Ser Jinên Iraqî: Kirîza Zêdebûyî, Rojnamevanên Ji Bo Jîngehê.
- Neteweyên Yekbûyî, 2021, Pênc Rê ji bo ku Guhertina Ekolojîk Bandorê li Ewlehiya Mirovan Bike.
- Komîsyona Bilind a Mafên Mirovan ya Neteweyên Yekbûyî: Lêkolîna Analîtîk Li Ser Guhertinên Ekolojîk yên ku Xatirgirtinên Cinsî Berçav Digirin.
- Camey et al., 2021, Têkiliyên di Navbera Tundiya Zayendî û Jîngehê de, USAID, 272 rûpel.

## Derbarê GAV de:

GAV ji bo alîkarî û geşpêdanê rêxistineke sivîl, ne-qezencî û bi pêşengiya jinan e ku li herêmên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê çalak e û li Ferensayê qeydkirî ye. GAV di warên xwe yên xebatê de ji bo bidestxistina aramiyê di astên cihêreng de dixebite. Ew bi bernameyên xwe piştgiriyê dide beşên cihêreng weke perwerde, avakirina karînan, piştgiriya ewlehiya xwarinê herweha avakirina ewlehî û aramiyê. Rêxistin di warê hişyariya tenduristiyê de jî çalak e.

Ji nêz ve bi civakên herêmî re kar dike da ku piştgiriyê bide civaka sivîl, redkirina tundî û tundrewiyê herweha parastina aştî û jiyana hevbeş bi nerîna jinan.